# Bultena heftane

# 25/11/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

Nûçeyên ji cîhanê

## Agirê têkoşîna xwişkên Mîrabel bi berxwedanê geş dibe

Têkoşîna ku piştî xwişkên Mîrabel bi pêş ket, jin ji wê rojê ve heta niha dest ji têkoşîn û berxwedanê bernadin. Piştî 63 salan jinên cîhanê dîroka berxwedanê dinivîsînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/agire-tekosina-xwisken-mirabel-bi-berxwedane-ges-dibe-42238

Çavkanî:JINHA




## ÎSÎG: Herî kêm hezar û 349 jinên karker jiyana xwe ji dest dan

ÎSÎG, bi boneya 25’ê Mijdarê di rapora xwe ya daneyên ji sala 2013’an vir ve berhevkiriyê de, eşkere kir ku herî kêm hezar û 349 jinan di dema kar de jiyana xwe ji dest dane.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/IsIg-heri-kem-hezar-u-349-jinen-karker-jiyana-xwe-ji-dest-dan-42247

Çavkanî:JINHA



## Li Elmanyayê di kampên penaberan de tundiya li dijî jinan zêde bûye

NAVENDA NUÇEYAN - Bi boneya 25'ê Mijdarê her diçe zêdetir rastiyên jin rû bi rû dibin, têne rojeva ragihandinê. Hate hînbun ku li kampên penaberan yên li Elmanyayê par 451 jin rû bi rûyê êriş û tundutijiyan hatine. Ruxmê li welat behsa parastin û ewlehiya bilind a di kampan de tê kirin, lê rûdanên tuntutijî pir zêde bûne û tê texmîn kirin ku rêjeya rudanan zêdetir be.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/222113

Çavkanî:JINNEWS



## Tiştên hat jiyîn di 'Derewên Spî' de bi bîra kolektîf tên vegotin

Derhênera Mexrîbî Asma Al-Moudir anî ziman ku di belgefîlma "Derewên Spî" de ku serhildanan li bajarê Kazablanka hat jiyîn digre dest, êşên hatine jiyîn bi bîra kolektîf vedibêje.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/tisten-hat-jiyin-di-derewen-spi-de-bi-bira-kolektif-ten-vegotin-42329

Çavkanî:JINHA



## Enstîtuya Fîlmên Ereb guldesteyên sînemaya Filistînê bê pere vekir

Palestinian Voices’ (Dengên ji Filistinê) ku di arşîva Enstituya Medya û Fîlmên Ereb de ye wê heta dawiya mehê bê pere be.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/enstituya-filmen-ereb-guldesteyen-sinemaya-filistine-be-pere-vekir-42332

Çavkanî:JINHA




## Pirtûka 'Berxwedan' a rojnamevana Îtalî Laûra Schrader derket

Pirtûka 'Berxwedan' a rojnamevana Îtalyayî Laûra Schrader a li ser serpêhatiya aştî û berxwedanê ya 20 salên dawî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nivîsand, ji aliyê weşanxaneya Edîzîone Pûnto Rosso ve hate weşandin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/pirtuka-berxwedan-a-rojnamevana-Itali-laura-schrader-derket-42350

Çavkanî:JINHA



# [Li Cezayîrê ji bo piştgiriya gelê Filistînê çalakî hat lidarxistin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-cezayire-ji-bo-pistgiriya-gele-filistine-calaki-hat-lidarxistin-42352)

Di Roja Piştevaniya Navneteweyî ya bi Filistînê re, jinên Cezayîrî li ber ofîsên Neteweyên Yekbûyî û Yekîtiya Ewropayê yên li Cezayîrê çalakî li dar xistin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-cezayire-ji-bo-pistgiriya-gele-filistine-calaki-hat-lidarxistin-42352

Çavkanî:JINHA



## Rojhilata navîn

# ‘Divê civak li hember tundûtujiyê hîn bêhtir hişyar be’

Çalakvanên jin ê herêma Raperînê diyarkirin ku her sal bi boneya 25 Mijdarê çalakiyên cûr be cûr li dar dixin. Jinên çalakvan diyar kirin îsal li hember jinê tundî pir zêde bûye û banga hişyariyê hat kirin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/dive-civak-li-hember-tundutujiye-hin-behtir-hisyar-be-42242

Çavkanî:JINHA




# 'Bêyî azadiya jinê prangayên civakê jî nayên şikandin'

Lêkolîner Mahtab Mahbub, di çarçoveya 25'ê Mijdarê de li Îranê zextên li dijî jinan tên jiyîn nirxand û wiha got: "Bêyî azadiya jinê, prangayên civakê jî nayên şikandin."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/beyi-azadiya-jine-prangayen-civake-ji-nayen-sikandin-42245

Çavkanî:JINHA




## [Jinên Tûnisî 25'ê Mijdarê nirxandin: Tundî her ku diçe zêde dibe](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-tunisi-25-e-mijdare-nirxandin-tundi-her-ku-dice-zede-dibe-42246)

Jinên Tûnisî diyar kirin ku demeke li gelek welatên cîhanê bi taybet li welatên Ereban tundiya li ser jinê zêde bûye, 25'ê Mijdarê pîroz kirin û gotin ku divê têkoşîna li dijî tundiyê bê bilidkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-tunisi-25-e-mijdare-nirxandin-tundi-her-ku-dice-zede-dibe-42246

Çavkanî:JINHA



## [Li Afganîstanê tundiya mêr: 2 zarok û 3 jin hatin qetilkirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-afganistane-tundiya-mer-2-zarok-u-3-jin-hatin-qetilkirin-42253)

Di mehên dawî de li Afganistanê mirina bi guman a jinan zêde bûye wekî din jî qetilkirina jinan aliyê Talîbanê ve tê teşwîqkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-afganistane-tundiya-mer-2-zarok-u-3-jin-hatin-qetilkirin-42253

Çavkanî:JINHA




# [Tevgera Şemiyê ya Binefşî: Talîban li hemberî jinan sûc dike](https://jinhaagency.com/ku/rojane/tevgera-Semiye-ya-binefsi-taliban-li-hemberi-jinan-suc-dike-42258)

Tevgera Şemiyê ya Binefşî diyar kir ku jin li Afganistanê rastî her cure tundiyê tên û bang li jinan kir ku li her cih û qadê têbikoşin.

[https://jinhaagency.com/ku/rojane/tevgera-Semiye-ya-binefsi-taliban-li-hemberi-jinan-suc-dike-42258](https://jinhaagency.com/ku/rojane/tevgera-Semiye-ya-binefsi-taliban-li-hemberi-jinan-suc-dike-42258)

Çavkanî:JINHA




# [Li Amedê jin li qadan bûn: Ji teslîmiyetê re na ji berxwedanê re erê](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-amede-jin-li-qadan-bun-ji-teslimiyete-re-na-ji-berxwedane-re-ere-42265)

Tora Têkoşîna li Dijî Tundiyê ya Amedê bi boneya 25'ê Mijdarê li Jînctiona Cîhanê meşek li dar xist.

[https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-amede-jin-li-qadan-bun-ji-teslimiyete-re-na-ji-berxwedane-re-ere-42265](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-amede-jin-li-qadan-bun-ji-teslimiyete-re-na-ji-berxwedane-re-ere-42265)

Çavkanî:JINHA



## Li Amedê di salekê de hezar û 499 serlêdanên tundiyê

AMED - Tora Têkoşîna li Dijî Tundiyê ya Amedê ragihand ku di nava salekê de li Amedê hezar û 499 serlêdanên şîdetê hatine kirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/222092

Çavkanî:JINNEWS




## Li zanîngehên Tûnisê kulûbên jinan hatin vekirin

Li Tûnisê ji ber ku xwendekarên jin rastî hemû cureyên tundiyê tên, kulûbên jinan li zanîngehan hatin vekirin. Bi vê yekê armanc ew e ku bendên dibin sedema bêdengiyê werin şikandin û jin dengê xwe bigihîjînin civakê.

https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/li-zaningehen-tunise-kuluben-jinan-hatin-vekirin-42271

Çavkanî:JINHA



# [Jinên ji Silêmanî li dijî tundiyê banga têkoşînê kirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-ji-silemani-li-diji-tundiye-banga-tekosine-kirin-42274)

Jinên bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê bal kişandin zêdebûna rêjeya tundiyê û banga tÊkoşînê li jinan kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-ji-silemani-li-diji-tundiye-banga-tekosine-kirin-42274

Çavkanî:JINHA



# [Li Lubnanê li dijî tundiyê çalakiyên 'Kampanyaya 16 rojan' dest pê kir](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-lubnane-li-diji-tundiye-calakiyen-kampanyaya-16-rojan-dest-pe-kir-42278)

Çalakiyên "Kampanyaya 16 rojan" ya Li Dijî Tundiya Xwe Dispêre Zayendparêziya Civakî ku di navbera 25'ê Mijdar û 10'ê Kanûna 2021'an de li Lubnanê pêk tê, dest pê kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-lubnane-li-diji-tundiye-calakiyen-kampanyaya-16-rojan-dest-pe-kir-42278

Çavkanî:JINHA



## [Nûnera RAWA: Em ê bingehên rizî yên rejîma Talîbanê bihejînin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/nunera-rawa-em-e-bingehen-rizi-yen-rejima-talibane-bihejinin-42279)

Nûnera RAWA’yê Azadeh Omîd li Kabîlê di çalakiya 25’ê Mijdarê de axivî diyar kir ku tevî hemû rejîmên dîktator ên li cîhanê piştgiriyê didin Talîbanê jî dê bi berxwedana xwe bingehên riziyayî yên rejîma Talîbanê bihejînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/nunera-rawa-em-e-bingehen-rizi-yen-rejima-talibane-bihejinin-42279

Çavkanî:JINHA



## [Li gundên Srî Lankayê li dijî tundiyê komên jinan hatin avakirin](https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/li-gunden-sri-lankaye-li-diji-tundiye-komen-jinan-hatin-avakirin-42281)

Li Srî Lankayê jinên mexdûrên tundiyê ku li malên stargeh dimînin, ji bo ji nû ve beşdarî jiyanê bibin bi bernameyên cur be cur pêştgiriya wan tê kirin. Ji bo bernameyên ku li dijî tundiyê tên meşandin zêde bibin, li gundan komên jinan hatin avakirin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/li-gunden-sri-lankaye-li-diji-tundiye-komen-jinan-hatin-avakirin-42281

Çavkanî:JINHA



# Jinên Helebce: Divê ji bo pêşîlêgirtina tundiyê hikumet bi erka xwe rabe

Jinên Helebce bi daxuyaniyekê kampnaya 16 rojî a pêşîlêgirtina tundîtûjiya beramberî jinê ragihand. Jinan diyarkirin ku divê jin li dijî tundîtûjiyê xwe rêxistin bikin û daxwazên xwe pêşkêşî aliyên peywendîdar kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-helebce-dive-ji-bo-pesilegirtina-tundiye-hikumet-bi-erka-xwe-rabe-42284

Çavkanî:JINHA



# Shailin Asadollahi banga piştgiriyê li jinan kir

Lîstikvana Îranî Shailin Asadollahi piştî serbestberdana xwe daxuyaniyek da û got: "Di vê pêvajoyê de ez bang li hemû jinan û gelê xwe dikim ku piştgiriyê bidin min, jin û hunermendên ku weke min rastî van zehmetiyan tên."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/shailin-asadollahi-banga-pistgiriye-li-jinan-kir-42288

Çavkanî:JINHA



# [Rê li ber zewicandina zarokan vedike](https://anfkurdi.com/jin/re-li-ber-zewicandina-zarokan-vedike-176290)

Parlamentera Mûşê ya HEDEP'ê Sumeyye Boz got, hukmê 'li gorî rewşa herêma pêwendîdar wê biryar bê dayin' a têkildarî diyarkirina temen ku di guhertina Fonê Ciwan û Malbatê de hate kirin, wê pêşî li zewicandina zarokan veke.

https://anfkurdi.com/jin/re-li-ber-zewicandina-zarokan-vedike-176290

Çavkanî:ANF



# [Ji jinên Şengalê ji bo hilbijartinê bang: Dengê xwe bidin xwe](https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-jinen-Sengale-ji-bo-hilbijartine-bang-denge-xwe-bidin-xwe-42290)

Jinên Şengalê bang li pêkhateyên Şengalê kirin ku hilbijartinên di 18’ê Kanûnê çêbibin de dengê xwe ji bo pêşerojek xweser û wekhev bi kar bînin û bidin namzedên xwe.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-jinen-Sengale-ji-bo-hilbijartine-bang-denge-xwe-bidin-xwe-42290



## Parlementera berê ya Efganistanê: Tekoşînek bi israr dive

Parlementera berê ya Efganîstanê Balqis Roshan diyar kir ku cîhan bi awayek bêdeng li sûcên ku li Efganîstanê li dijî jinan tê kirin temaşe dike û destnîşan kir ku ew ji dîrokê fêrî têkoşînekê bi israr a ji bo gelan bûne.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/parlementera-bere-ya-efganistane-tekosinek-bi-israr-dive-42292

Çavkanî:JINHA



## ‘Kampanya 16 Rojan li dijî tundiyê hişyariyê ava dike’

Jinên Qahîre derbarê ‘Kampanya 16 Rojan’ ya ku NY her sal di 25’ê Mijdarê de li seranserî cîhanê dide destpêkirin de nirxandin û diyarkirin ku bi armanca ku li dijî tundîtûjiyê li hemû cîhanê avakirina hişyariyê ev kampanya giring e.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/kampanya-16-rojan-li-diji-tundiye-hisyariye-ava-dike-42294

Çavkanî:JINHA



# [Arwa Kairouaniya xizmet dide jin û zarokên tundî dibînin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/arwa-kairouaniya-xizmet-dide-jin-u-zaroken-tundi-dibinin-42299)

Navenda Stargeha Jin û Zarokên Rastî Êrîşa Zayendî tên a Arwa Kairouaniya, ji bilî ji bo jinên rastî tundiyê tên bi zarokên wan re xizmeta stargehê dide, piştgiriya hiqûqî û derûnî jî dide.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/arwa-kairouaniya-xizmet-dide-jin-u-zaroken-tundi-dibinin-42299

Çavkanî:JINHA




# [Li Ranya Festîvala Perî ya berhemên karê dest destpê kir](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-ranya-festivala-peri-ya-berhemen-kare-dest-destpe-kir-42301)

Li Ranya bi dirûşmeya ‘Jin pêşengên civakê ye’ cara yekem festîvala Perî ya xwarinên Kurdewarî û karê destan destpê kir û festîval dê dû rojan dom bike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-ranya-festivala-peri-ya-berhemen-kare-dest-destpe-kir-42301

Çavkanî:JINHA



## Mamosteyan ragihandin ku wê boykotê bidomînin

Mamosta, fermanber û çalakvanan xwepêşandanên berfireh li darxistin û ragihandin heta ku daxwazên wan neyên bicih anîn wê boykota wan bidomînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/mamosteyan-ragihandin-ku-we-boykote-bidominin-42302

Çavkanî:JINHA




## ‘Ji ber rewşa Başûrê Kurdistanê ciwan koç dikin’

Mamoste Şine Elî diyar kir ku ji ber qeyrana aborî ya li Başûrê Kurdistanê û boykota xwendinê ciwan bêhêvî bûne û got: “Ger rewş wisa bidome, ciwan wê dest bi koçkirinê bikin. Li cihê ku hikumet di pirskirêka ciwakê çareser bike bi xwe qeyranan çêdike.”

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/ji-ber-rewsa-basure-kurdistane-ciwan-koc-dikin-42305



## ‘Erka hunermendan hişyarkirina civakê ye’

Hunermenda şêwekar Jîwan Baqî diyar kir ku huner bandorê li ser civakê dike û dibe dengê civakê, divê hunermend bi berhemên xwe hewldana kêmkirina tundiyê bide û hişyariyê belav bike.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/erke-hunermendan-hisyarkirina-civake-ye-42307



## Talîban nahêle jin di pêşangehan de berhemên xwe bifiroşin

Jinên Efgan ên ku ji bo bidestxistina dahata aborî beşdarî pêşangehên li Kabîlê dibin rastî zextên Talîbanê tên. Jinên ku dixwazin berhemên xwe pêşkêş bikin gotin ku ew ê li dijî zextên Talîbanê serê xwe netewînin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/taliban-nahele-jin-di-pesangehan-de-berhemen-xwe-bifirosin-42308

Çavkanî:JINHA







## Li Tûnisê li dijî jinan tundiya siyasî didome

Profesora felsefe Hayat Hamdî destnîşan kir ku jinên Tûnisê ji xebatên siyasî tên dûrxistin, Maha Beşîr jî diyar kir ku jinên dixwazin tevlî siyasetê bibin rastî tundiyê tên.

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/li-tunise-li-diji-jinan-tundiya-siyasi-didome-42309

Çavkanî:JINHA



## Li Amedê 4 girtiyên jin dest bi greva birçîbûnê kirin

Hat zanîn ku li Girtîgeha Girtî ya Jinan a Amedê rojnameger Derya Ren jî di nav de 4 jinan dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-amede-4-girtiyen-jin-dest-bi-greva-bircibune-kirin-42310

Çavkanî:JINHA



## ['Hin 60 jinên Filistînî di girtîgehên Îsraîlê de ne'](https://jinhaagency.com/ku/rojane/hin-60-jinen-filistini-di-girtigehen-Israile-de-ne-42315)

Komeleya Girtiyên Filistînî ragihand ku hin jî 60 girtiyên jin ên Filistînî di girtîgehên Îsraîlê de ne.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hin-60-jinen-filistini-di-girtigehen-Israile-de-ne-42315

Çavkanî:JINHA




## Nagîn Çaparyan a ku îşkence lê hat kirin dê derkeve pêşberî dadgehê

Nagîn Çaparyan a ku ji aliyê fermandarê artêşê ve rastî tundiyê hat, tevî ku giliyê sûcdarê tundiyê kir jî dosya hat girtin. Nagîn Çaparyan wek bersûc hat girtin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/nagin-Caparyan-a-ku-iskence-le-hat-kirin-de-derkeve-pesberi-dadgehe-42317

Çavkanî:JINHA



## Li Wargeha Mexmûrê dewreya perwerdeya ragihandinê

Atolyeya Ragihandina Ciwanan a Wargeha Şehîd Rustem Cûdî Mexmûrê hewl dide bi perwerdeyan derfetên xwe pêşxistinê ji ciwanan re ava bike û girîngiya ragihandinê di nava civakê de bide pêşxistin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-wargeha-mexmure-dewreya-perwerdeya-ragihandine-42320

Çavkanî:JINHA



## Çalakvana Yemenî Asia Almashraqi hêjayî Xelata Nansen hat dîtin

Çalakvana Yemenî Asia Almashraqi xelata Nansen a Navneteweyî ya Alîkariya Penaberan bi dest xist, ev xelat ji bo rêzgirtina ji hewldanên jinan di warê alîkariyên mirovî û başkirina jiyana penaberan de tê dayîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Calakvana-yemeni-asia-almashraqi-layiqe-xelata-nansen-hat-ditin-42322

Çavkanî:JINHA



# ['Di pêvçûnên li Rojhilata Navîn de jin zêdetir berdêl didin’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/di-pevcunen-li-rojhilata-navin-de-jin-du-qat-zedetir-berdel-didin-42323)

Jinên Mexribê Hind Mumeyez û Malîka Zakhnînî ya bal kişandin ser polîtîkayên hêzên serwer ên li Rojhilata Navîn, diyar kirin di pevçûnên li Rojhilata Navîn de jin du qat zêdetir berdêl didin û bal kişandin ser girîngiya piştgiriya jinan a navneteweyî.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/di-pevcunen-li-rojhilata-navin-de-jin-du-qat-zedetir-berdel-didin-42323

Çavkanî:JINHA



# ‘Divê her roj bibe roja têkoşîna li dijî tundiyê’

Endama Rêxistina Karêgeriya Tora Hevbeş Emîne Ehmed diyar kir ku ne tenê divê 25’ê Mijdarê hewldana ji bo kêmkirina tundiyê bidin pêwîst e 12 mehên salê her roj li dijî tundiyê rawestin û got: “Divê jin dakevin qadan û hemû qadan tije bikin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-her-roj-bibe-roja-tekosina-li-dijI-tundiye-42324

Çavkanî:JINHA



## Maryam Shokranî gazî dadgeha cezayê hat kirin

Rojnamevan û çalakvana medyayî Maryam Shokranî gazî Dadgeha Cezayê Hejmara 2 a Tahranê hat kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/maryam-shokrani-gazi-dadgeha-cezaye-hat-kirin-42325

Çavkanî:JINHA



## Saadet Akin a di greva birçîbûnê de ye stranek nû çêkir

Saadet Akin a tevlî greva birçîbûnê dorveger ya bi daxwaza “Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî” hat destpêkirin bû, bi strana xwe ya nû bang li raya giştî kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/saadet-akin-a-di-greva-bircibune-de-ye-stranek-nu-cekir-42348

Çavkanî:JINHA




## ‘Divê jin ji bo hemû mafên xwe têbikoşin’

Jinên Tevgera Azadiya Komeleya Kurdistanê rewşa jinan û êrîşên bi armanca tundiya li ser jinan nirxandin û diyar kirin ku jin dikarin bi fikrên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan têbikoşin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-jin-ji-bo-hemu-mafen-xwe-tebikosin-42349

Çavkanî:JINHA




## Li Amedê hewldana kuştina jinekê

AMED - Li navçeya Rezanê mêrê bi navê E.S. hewl da ku H.S.ya ku bi mahra olî pê re zewicîbû û paşê ji hev cuda bûbûn, bi çekê bikuje.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/222316

Çavkanî:JINNEWS



## Barê giran ê jiyanê li ser milên wê ma

ÎDIR - Fatma Avciyê ku 28 sal berê bi awayek bi guman hevjînê wê ji holê windabû şûnde barê giran ê jiyanê hemû li ser milên wê maye û ligel hemû zehmetiyan zarokên xwe mezin kiriye, hîna jî çavên wê li rêya hevjînê wê ye.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/222351

Çavkanî:JINNEWS



## Tundiya dîjîtal çi ye?

BURSA - Li hember jinan ligel tundiya fîzîkî ya dîjîtal jî zêde bûye. Tundiya dîjîtal, bi armanca kontrolkirin, biçûkxistin, cezakirina jinan tê îfadekirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/222355

Çavkanî:JINNEWS



## ji sedî 50 jinên li Iraqê rubiruyî tundûtujiya medya dijîtal tên

Serokê Navenda Stratejî ya mafên mirovan a Iraqê ragihand ku ji sedî 50'yê jinan li Iraqê rubirûyî tundûtujiya medya dijîtal tên û got; "Herî zêde jin li ser medya dijîtal rubirûyî tundûtujiyê tên, ev jî rêjeyek mezine û metirsîdare."

https://hawarnews.com/kr/ji-sedi-50-jinen-li-iraqe-rubiruyi-tundutujiya-medya-dijital-ten

Çavkanî:ANHA



## Li Lubnanê krîza aborî bandorek nebaş li ser jinan dike

Krîza aborî ya ku li gelek welatên cîhanê zêde dibe li Lubnanê jî bandora neyînî li ser jiyanê dike. Bi taybetî jinên ku debara malbatê bi tena serê xwe dikin, ji ber bihabûn û mûçêya kêm zehmetiyên ku dikşînin anîn ziman.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/li-lubnane-kriza-abori-bandorek-nebas-li-ser-jinan-dike-42366

Çavkanî:JINHA



Nûçeyên herêmî

## [Suriya Ebîd a gundê wê tê topbarankirin: Ez û şervanek yek in](https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/suriya-ebid-a-gunde-we-te-topbarankirin-ez-u-servanek-yek-in-42237)

Sûriya Ebid a 70 salî ku li xeta agir dijî, bi amadekariyên dike rastiya gelê şoreşgerî nîşan dide dibêje: “Her car em xelikê gund tên topbarankirin. Em li kêleka şervanên xwe disekinin, jiyana min wekî ya wan e."

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/suriya-ebid-a-gunde-we-te-topbarankirin-ez-u-servanek-yek-in-42237

Çavkanî:JINHA



## [Weqfa Jina Azad a Sûriyê ji bo jinan derfetên kar diafirîne](https://jinhaagency.com/ku/rojane/weqfa-jina-azad-a-suriye-ji-bo-jinan-derfeten-kar-diafirine-42268)

Weqfa Jina Azad a Sûriyê ku jinan di hemû aliyê jiyanê de bi rêxistin dikin û projeyên cuda derfetên kar dide jinên Sûriyê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/weqfa-jina-azad-a-suriye-ji-bo-jinan-derfeten-kar-diafirine-42268

Çavkanî:JINHA



# 'Leyla Mistefa li hember hemû astengiyan li ber xwe da'

Meclîsa Kongra Star, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) ji bo malbata Hevseroka berê ya Meclisa Sivîl a Reqayê Leyla Mistefa pêyamên sersaxiyê dan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/kongra-star-leyla-mistefa-li-hember-hemu-astengiyan-li-ber-xwe-da-42283

Çavkanî:JINHA



# Jinên ku li Idlibê bê ewle dixebitin mafên wan nayê dayîn

Jinên ku di karên bê ewle de dixebitin û di karên ku tên îstîsmarkirin de ger qezayek kar derbas bikin nikarin mafên xwe bigrin. Ghadir Arafat diyar kir ku ji bo parastina mafên karkeran pêwîst e sendîka bê avakirin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/jinen-ku-li-idlibe-be-ewle-dixebitin-mafen-wan-naye-dayin-42311

Çavkanî:JINHA



# [Jinên nexweşên şekir li kampên Idlibê di bin xeterê de ne](https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/jinen-nexwesen-sekir-li-kampen-idlibe-di-bin-xetere-de-ne-42353)

Jinên nexweşên şekir ku di bin şert û mercên dijwar de li kampên Idlibê dijîn nikarin dermanên pêwîst bikirin û tedawiya xwe bibînin.

https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/jinen-nexwesen-sekir-li-kampen-idlibe-di-bin-xetere-de-ne-42353

Çavkanî:JINNEWS




# [Li Dêrazorê jinan bal kişand ser tundiyê](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/222379)

NAVENDA NÛÇEYAN - Li Dêrazorê di semînerekê de jinan bal kişand ser tundiyê, sedem, cure û rêbazên tunekirina wê û îşaret bi girîngiya xurtkirina rola jinan a di civakê de kir.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/222379

Çavkanî:JINNEWS



Kongra Star

2.12.2023